Sersalîya *serhildana* gelê kurdistana surye

Xûshk u birayên birêz:

evru sersala duweme ji serhildana gelê meyî kurdî pîroze,u jibo vê yekê pêwîste ku em serê xu birêzîtî li pês xûna qirmizî ya van sehîdên qehmanên pakrewan nizim bikin u daxînin,u suz bidin ku tu caran em dilêrî u comerdîya wan ji bîre nakin,herdem ewne ê di koska dilê mede bijîn , u li dîroka wanî bixûnê neqis kirine xudî biderkevin,ta ko armancên wanî giranbiha serfîrazîya gelê kurd li surye bi ser bilindî pekbînîn, lê belê eve barekî girane,ne her merovek dikare hilgire,dibe ko pêlaneke rast u diristî sehreza u dezgehên gelêrî,u berî wê ykîtîyeke netewî ya sîyasî u civakî u rewsenbîrî u herweha bi hemî rengên wê pêk were,bese ko neyarên kurd ew pare pare kirine,u bi ramanin wan lîstine,u gelek nîkokî u merez u nexwesiyên giran derbazî hundir u rehên wan kirine.

- Jîyana xinizî u bindestîyê jiyanke qirêje girane u sevên wê gelekî tarîne ,lewre pewîste ko sîyasetmedarên me u rêxistin u komelên meyî herrengî u hemi xort u kecên me li mafên gelê xweyî bindest xudî bi derkevin u biparêzin.
- Xûsk u birayên xusewîst:
- Hirêma rojhilata navîn bitevayî u suryê biteybatî di rewseke tenikre derbazdibe.
- U rêjîma surî ya kevinperest u xunmij welatê me xistîye devê topê ji bo parastina bercewendîyên xuyî kesayetî, cinkî ew li ser pistên tang u zincîrlîyan u bizora cek u rextan gihîstîye serdestiyaxo vêca avêtina wîjî herweha weloye.
- Ji ber wê ewqas pêwiste dandin u sitandin bi ew komarên cihanê xudi hêz u biryar u bercewendîyên wan u yên gelê me cara yekeme ko têne ba hev.
- Wek hûn bas dizanin xêzên sur u sinorên kelem hatine roxandin u cirandin .u nema kesek dikare bibêje ev tistê minîhûndire ez cawa duxazim karim bikim,nêmune weke cawa li belqanê u li darforê u li berrîya roj avayî afrîqayê u li hinek deverin cihanê êy din
- Xûsk u birayên hêja:
- Hêvîdarim ko ev kongirê nav netewî ji bo pirsgirêka gelê kurdistana suryê qehreman bibe sedemek ji sedemên alikarîya navnetewî ya giring jibo pêkanîna demuqrasîyê li suryê u zelalkirina fermî ji mafên gelê meyî kurdre li rojavayî Kurdistanê.
- Li dawîyê rêz u silav u serkeftinê ji were dixazim .

10/ 03 /2006

Partîya Demokrat Kurdistan - Surîye